# PEYWENDIYA DILDARÎ

Ehmed Mistefa

Peywendî yan hevbendiya dildarî, li her civakek ji civakên cîhanî, rewişt û adatên xwe yên taybet hene. Û li dû van adat û rewiştan jî; jiyana wan ya rojane bi rê ve diçe. Çi ev rewişt e, adat e li def hindekan ji aliyê hindek kesan ve xelet be yan durist be. Ya giring li vê dirê ev e ye parastina van rewiştan e yên ji kevin da, ji bab û bapîran ve hatine veguhastin. Lewma her serpêçek bête kirin di vî warî da zurbey car bi xeletî qelem diden gihurîn bi zehmet têne kirin yan jî hêdî-hêdî têne kirin da çi deng vedanî û çi arîşa peyda nekin ji layê xelkî ve wî gelê vî welatî ve. Evca bigire ji layê rewşenbîrî, civakî, aborî, ramyarî û...hd. Ji ber vê çendê eger bêt û temaşekine layê evînî û dildarî dê bibînin her miletekî saxletên xwe yên taybet hene. Adat û teqalîdên taybet hene her destpêka hejêkirinê wî heta gehiştine êk dû û paşî şahiyan û dîlanêt wan, çi komeleyên rojhelat in yan rojavayên û her wesa di nav van komeleya wî dewleta jî dibînî her welatekî wî her deverekê rewişt û adat wî teqalîdên taybet hene. Her wesa, her ûcaxekê (qibîle), yan eşîretekê jî yê taybet hene û kartêkirin li ser jiyanê heye, li ser peywendiyên evînî, dildarî û eger bêt û behsê komeleyê xwe bikin

wê bibînin ku gelek yê pêgîre bi van urif û adetan ve gelek pê parastiye bi van rewişt û teqalîdan ji kevin da ta niho û wek parêzerek bûye ku ev tişt e ji dest neçe û berze nebe û eger pêçewan bû heçwekî mejiyan têkday xeletî peyda bû lewma dê bibêjin zeman yê pûç bûy! Ka yê berê û ka yê niho?!

Niho, eger em bêyn li ser vî babetî yê me îşaret pê day, peywendiya dildarî wê bînin ev tiştek e ji kevin da li def me kurdan heye, bes hemû gavan divêt, bi hişyarî bête kirin, çi dengvedana nekin lewma hemû gavan civak bi hişyarî seh dikê û hindek caran bi neciwanî û şermezarî seh dikê. Bo çi, ji ber ku eger diyar bû ev peywendî ye dê bibe cihê şermezariyê bo her du layan bi taybetî bo kiçê, gelek caran dibe egerê hindê vê kiçê nedine şû yan jî ya gehiştî ye qunaxên tirsnaktir jiyana xwe ji dest daye bûye egerê têkçûna peywendiyan li navbera du malan, yan du ûcaxan heta du hozan (eşîran). Lewma civak bi vî rengê şermezariyê seh dikê da dubare nebe û hez dike hemû gavan bi rêka kurt û sanahî bête encam. Yekser kiç bête xwastin û veguhastin bidin kurekî hindek caran nedîtî û bê çi viyan li navbera wan de hebe. Ev jî helbet kartêkirineke mezin hebûye wek berdan û jinînaneke dî (jinek bi ser înan) û ji bilî arîşeyên dî yên rojane wek silbûn û qutan û zîz bûn.... Her wesa, civak bi şermezarî li vê peywendiyê dinêre, ji ber ku wesa hizir dike ev tiştek lawaz e û kêmasiye.

Her wesa civak bi çavekê xirab li vê çendê dinêre, ji ber ku hizir diken ev kesane derheqê vê evînê dernakevin û neşên bi dûmahîk bînin û bi rengekê durist û saxlem, ditirsin tûşî arîşeyan bibin, lewma her dem bi xirabî seh dikin.

Xaleke dî ya giring nêrîneke neciwan, ji bo vê çendê eve ye ku civak dibîne ev tiştekê çavlêkirine ji komeleyên biyanî û Rojavayî hatiye û nevê ev bibe rewişt û adetekê nû di nav civakê me yê kurdewarî de. Çunke di gel civakê me, urif û adetên me nagunce.

Xaleke dî eve ye ku peywendiyên xizmatî di navbera kurdan de zor nêzîk e û zorbey xelkî hev du diniyasin, anku civakê me yê biçûk e û bo êk û du berniyas e lewma her tiştek bi vî rengî peyda bû zû di nav xelkî de belav dibe û dibe cihê şermezariyê bo her du layan.

Xaleke dî eve ye her peywendiyek peyda bû xelk û civak bi xeletî hizir dikin, dibe tayê xirabiyê û hetkberyê eger xwe çi rû nedabe jî ku dibe egerê têkildana navê wan.

Xaleke dî ya giring wekî me gotî, civakekê berteng û biçûk e

lewma ev cor e peywendî berze nabe û dê aşkira be evca xelk û civak bi xirabî vê peywendiyê şirove dikin, dengdana wê eger xwe durist jî be dê bi xirabî hête belav kirin..

Derbarey kiç û kuran bo çî ew bi xwe, bi vê şêwazê û rengî berê xwe didin êk, helbet ev xalên hatîne diyarkirin kartêkirineke mezin li ser derûna van her dukan heye, anku dê di haletekê (qeleq) da jîn û peywendiyeke bi tirs û lerz diborînin. Lewma bi vî rengî li xwe dinêrin.

Xala duwê, ji ber tirsa civakî xelkê wan, bi xwe jî bawerî, bi vê peywendiyê naîne ji tirsên civakî çavên xelkî lewma zorbey caran ev ji layê kiçikê peyda dibe ditirse kurik hevalîniya durist neke peywendiya wî ya dildarî bo borîna wextî û xweşiyeke çend rojî û heyvî be, ne peywendiyeke paqij be.

Ji ber ku kiç nav û dengê wê parastiye, ji mala wê ta nav civakî ji ber vê çendê, ditirse û bi şermezarî li xwe dinêre, anku ev peywendiye ya durist be hejêkirineke paqij be. Belê her ditirse her weku xeletiyek mezin kiriye.

Xaleke dî ya giring me divêt bibêjin ev e ye ku peywendiyên dildarî hejêkirin û evînî ji mêjewere ya li nav kurdewariyê de hey, belê bi rengekê hişyarî û parastî ya hatiye kirin eger ji sînorê xwe yê giştî derkeve, helbet bûye arîşe û tûşî çend nexweşiyan û rûdanan bûye.

Xaleke dî, evînî peywendiyên dildarî eger berawardî yekî bikin di nav komeleyê me berî 30 sal ta noke eger pitir nebe ev peywendiyên dildarî bawer bike kêmtir nîne belê wekî me got, bi hişyarî derketin gelek nebin axivtin hebe da êk û du pitir biniyasin û pitir di êk û du bigehin.

Tiştê giring li vê dirê eve ye bibêjin bo çi kur hej kiçikê dike yan kiç hej kurikî dike, yan ji ber ciwaniyê yan rewiştî (axlaq) yan zengîniye barapitir (axlaq) e ku bi êk û du razî bin peywendiya dildarî bi hêz bike bese ku zûka bixwaze û bîne da çi dengvedan bi xirabî neête kirin.

Xaleke dî ev e ye ku em dişêyn bibêjin ragehandin, televizyon, setelayit çavvebûna xelkî bo ji derve gelek kartêkirin kiriye ser jiyana xelkî. Bi taybetî ji layê peywendiyên dildarî ve, peywendiyên dildarî niho gelek hene, belê divê bi rêkên durist û ciwan bêne kirin ji sînorê xwe dernekevin..

Xaleke dî ya giring, eger em bibêjin peywendiyên dildarî bila wekî yê ji derve lê bihên anku welatên biyanî ev e jî tiştekê bi zehmet e nahête kirin bi vî rengê berella wekî li wê dirê hey.